

# NAVEROK

PÊŞGOTIN .....	IX
DESTPÊK Û SALOXDANA BERHEMÊ .....	1

## BEŞA YEKEM

NIRXANDINA BERHEMA MELA MISTEFAYÎ .....	3
NIRXANDINA NAVEROKA BERHEMÊ .....	5
2.1. Dema Borî .....	5
2.2. Dema Niha .....	6
2.3. Dema Dahatî .....	6
2.3. Raweya Fermanî .....	7
Encam .....	7
ÇAVKANÎ .....	8

## BEŞA DUYEM

METINA BERHEMÊ YA LATÎNÎZEKIRÎ DIGEL TAYBETMENDÎYÊN RÊZIMANÎ .....	11
---	----

## BEŞA SÊYEM

METINA LATÎNÎZEKIRÎ .....	65
---------------------------	----

## BEŞA ÇAREM

FAKSÎMÎLE.....	79
----------------	----



## PÊSGOTIN

Peydabûna berhemên li ser zimanê kurdî ku di demên kevin da hatine nivîsin, ji bo tarîxa xebatê zimanê kurdî gelekî giring e. Yek ji van berheman jî ya Mela Mistefayî ye ku bi navê “Rahênanê Zimanê Kurdi”yê ye û di sala 1880yî da hatîye nivîsin. Navê berhemê ne ji alîyê Mela Mistefayî ve, lê ji alîyê A. Jabayî ve û bi fransizî wekî “Exercices de la Langue Kurde”yê hatîye danîn ku kurdîya wê dibe “Rahênanê Zimanê Kurdi”. Ev berhema Mele Mistefayî jî wekî berhemên din gelekî giring e ku di koleksîyonâ Jabayî da cih girtine.

Mela Mistefayî ev berhem ji bo fîrkirina kurdîya kurmancî ya A. Jabayî amade kirîye û berhemeka rahênanî ye. Mela Mistefayî ji alîyê rastê ve mînak rêz kirine, bi dû ra jî Jabayî xwendina van mînak bi latînî nivîsiye û li nik wan jî wergêrana wan a fransizî nivîsiye. Dema ku em vê keda Jabayî bidin ber çavan, em dikarin bibêjin ku Jaba nivîskarê duyem yê vê berhemê ye. Di xebatê da li ser mijarêñ rêzimanî yêñ wekî dem, rawe û avahîyê, zêdetirî heşt sed mînak hatine pêşkêşkirin. Ji alîyê deman ve bi taybetî li ser sê demên sereke, borî, niha û dâhatîyê sekinîye û berhema wî bi piranî ji mînakêñ van deman pêk dihê.

Me di vê xebata xwe da hem nirxandina vê berhemê kirîye hem metin latînîze kirîye hem jî metina latînîzekirî di nav tabloyan da û digel taybetmendîyêñ wan ên rêzimanî daye. Herweha me kopîya orîjînal a berhemê jî di beşa dawî da daye. Yanî di vê pirtûkê da çar beş hene ku beşa yekem nirxandina berhemê, beşa duyem di nav tabloyan da metina latînîzekirî digel taybetmendîyêñ wan ên rêzimanî, beşa sêyem metina berhemê ya latînîzekirî û beşa çarem jî kopîya orîjînal ya berhemê ye. Ji ber ku kopîya orîjînal ya berhemê jî tê da heye mirov bi hêsanî dikarin xwe bigihîjinê û xebatê cuda li ser wê bikin. Herweha bi vî awayî, berawirdkirina bi metina latînîzekirî jî mimkun dibe û bi vî awayî mirov dikarin şaşî û kêmasiyêñ me jî tesbît bikin.

Em ji bo Reşo Zîlanî û Mehmûd Lewendîyî spasdar in ku ji bo kontrolkiriñê dema xwe veqetand û pêşnîyazêñ xwe bi me ra par ve kirin. Em kêfxweş in ku berhemeka weha giring pêşkêşî pirtûkxaneya kurdî dikin û em hêvî dikin ku dê bigihîje ber destê gelek kesan û sûdê jê wergirin.

**Mikail Bülbül - Mustafa Öztürk**

**Dîyarbekir - Mêrdîn, 2021**